



# Bernameya samanên siruştê

KURMANJI

**Bernameya samanên siruştê/  
xwezayê bernameyeka pişeyî  
ye û bidestxistina dîplomeya  
pişeyî armanca wê ye.**

Bernameya samanên siruştê ji te re yê ku hez dike karên girêdayî nebat, heywan, erd, av yan daristanê bike.

Tu dikarî piştî qedandina xwendinê yekser kar bikî yan xwendina xwe li xwendengeha bilind ya pişeyî berdewam bikî. Tu dikarî jî ji xwe re kursên zêde bixwîni da xwendina xwe li xwendengeha bilind bidomîni.

## ÇAR PISPORIYÊN CUDA

### Heywan

- Tu dê zanyariyan li ser heywanan, tevgera heywanan û hevahengiya di navbera heywan û mirovan de werbigirî. Ev pisporî îmkane dide ku tu wek, bo nimûne, karê bi kûçikan re, lênêrê heywanan yan sexbêrkerê hespan, ya ku digehe pisporiya siwarbûnê yan loqê, kar bikî.

### Cotkarî

- Tu dê zanyariyan li ser erd, av, nebat, heywan, aborî û teknîk, berhemdana xizmetkariyan û giringiya cotkariyê ji bo pêşveçûna gundan werbigirî. Ev pisporî îmkane dide ku tu wek, bo nimûne, di warê xizmetkariyên herêmên gundan de, di cotkariya ku digehe pisporiya makîne, heywan yan çandiniyê de kar bikî.

### Daristan

- Tu dê zanyariyan li ser daristanê wek samanekê werbigirî û zanîna xwe li ser teknîk û biyolojiyê kûrttir bikî. Ev pisporî îmkane dide ku tu wek, bo nimûne, nêçîrvan û parêzerê heywanên kûvî, rêberê di siruştê de, ajotinkarê makîneyên daristanê yan sexbêrkerê daristanê kar bikî.

### Baxçe

- Tu dê fêrî zanyariyan li ser erd, nabat, jîngehên nebatan û giringiya baxçeyî di civakê de werbigirî. Tu dê fêrî biyolojî, teknîk û aboriyê jî bibî. Ev pisporî îmkane dide ku tu wek, bo nimûne, di warê sexbêriya jîngehên derve, saziyên baxçeyan, çandiniya baxçeyan – ya erdê vekirî yan xaniyên çandiniyê kar bikî.

## Tiştên ku tu dê di vê bernameyê de fêr bibî

Di vê bernameyê de, tu dê şiyana xwe ya bikaranîna siruştê/xwezayê pêşde bibî. Fehmikrina te ji bo piralîtiya siruştê û çawa çalakîyên cuda tesîrê li siruştê dikin dê zêdetir bibe. Tu dê fêrî biyolojî, jîngehnasî, teknîk û aboriyê jî bibî.

Bona mirov xwe ji zîyanên karî biparêze û tenduristiyeke baş pêk bîne, giringiyeka mezîni di vê bernameyê de li ser pirsên jîngeha karî ye.

**Bername weha hatiye rêxistin**

Madeyên dersê di bernameyên pişeyî de madeyên lîseyê yê hevbeş in: Îngilîzî, dîrok, werziş û tenduristî, matematîk, zanist, zanyariyên dînî, zanyariyên civakê û zimanê swêdî yan swêdî wek zimanê duyê.

Di bernameyên pişeyî de, tu dê zêdetir madeyên pişeyî, yê ku jê re madeyên taybetmend tê gotin, û kêmtir madeyên ku te li dibistana bingehî xwendine bixwînî.

Biyolojî, mitehîdî û bikaranîna siruştê madeyên taybetmend yê hevbeş yê ve bernameyê ne.

Îmkan heye ku tu di bernameyê de xwe pisportir û zanatir bikî. Ji wê re bernamekûrkolîn (programfördjupning). Ji xwendingehê bipirse ka ew kîjan kursên kûrlêkolînê dide.

Hilbijartina ferdî jî heye ku tu dikarî wê ya ku tu dixwazî bixwînî hilbijêrî. Ji xwendingehê bipirse ka kîjan kurs hene.

**Awayên xebatê**

Tu dê di vê bernameyê de bi awayê rexneyî bikolî û bifikirî ka tu dê çawa bikarî berdewam siruştê bi kar bînî. Tu dê li ser pirsên ku tu dê bi serê xwe yan bi yê din re çare bikî hereket bikî. Tu dê şiyana xwe ya înisyatîfgirtinê û pêşxistina çareyên nû û behremend xurt bikî û zanyariyan li ser îmkanên birêvebirina şîrketeka şexsî werbigirî. Tu dê xwe fêr bikî ku wezîfeyên karî plan bikî û bi cih bînî û piştê encamê binirxînî.

**Projeya lîseyê**

Tu dê di dawiya Bernameya samanên siruştê de projeyeka lîseyê di warê karê destan yê ku te bijartiyê de amade bikî. Tu dê bi wê nîşan bidî ku zanyariyên pêdvî yê ji bo destpêkirina karê ku te ji bo xatirê wî xwendiyê li bal te hene.

**Fêrbûna li cihê karî**

Hin beşên xwendinê herî kêmtir 15 hefteyan li cihê yan çend cihên karî bi rê ve diçin û jê re arbetsplatsförlagd lärande (apl) – fêrbûna li cihê karî – tê gotin. Ev parçeyeka giring ya perwerdeyê ye. Apl tecrîbeyan û herweha kontaktan yê ku dikarin di dema lêgerîna karî de ji te re bisûd bin dide te.

**Şagirdikirin**

Heger xwendingeh di çarçoveya bernameyê de perwerdeya şagirdikirinê ya lîseyî pêşkêş bike, tu dikarî wê hilbijêrî. Maneya wê ew e ku tu dê heman zanyariyan werbigirî lê dê herî kêmtir nîva xwendina xwe li cihê yan çend cihên karî bikî.

**Balkişandin**

Giring e ku tu xwendina xwe plan bikî heger tu bixwazî şertên bingehî xwendina bilind bi dest bixî. Ji bo bidestxistina şertên bingehî yê xwendina bilind tu dikarî li gor dilê xwe di çarçoveya hilbijartina ferdî û bernamekûrkolînê de, heger xwendingeh wê pêşkêş bike, kursên pêdvî bixwînî. Ew du kursên zêdetir yê zimanê swêdî yan swêdî wek zimanê duyê û kurseka zimanê Îngilîzî ne. Heger tu bixwazî hêjî bixwînî, li gel rêberekê xwendin û pişeyê biaxve.

Hergav mafê te heye ku tu di çarçoveya hilbijartina ferdî de kurseka din ya zêde di warê werziş û tenduristiyê de û kurseka hilbijêrî.